



folklorame

Zargotin pişt e, folklor her tişt e!

Hejmara 5. | Adar • Nîsan • Gulan 2020

Biha: 15¢

Padîşah û wezîr
Kurdjan Sorî

Nanê binê agir
Elîf Gunduz

Hesenê Aşewan û riwî
Hikmet Yildiz

Kundirê dagirtî
Zîya Mukrîyanî

Motîfên Çîroka Hebhenarkê
Haşim Esen

Koyê Bîngolî
Aydin Batur

Pêkenokên Helexîyan
Elîf Gun

Hero herrin
Zerrweş Xodî

Orhan Tanhan

ISSN 26676443



9 772667 644002



Pîra Dondik (1932 -)

Pîra Dondik, ji Kurecika Arxaya Meletiyê ye. Pîra Dondê bawermendeka Ehlî Heq e. Li Herêma Kurecîkê 24 gundên Ehlî Heq hene û pîranîya wan di wexta xwe da, ji Dêrsimê koçber bûne û li Kurecîkê bi cih bûne. Pîra Dondê reş girêdaye çimkî wê gelek êş kişandine û ew bûye şahidê gelek bûyerên xemgîn.

folklorame



folklorame

Mustafa Gazî (Seyda)
1956-28. 11. 2017

 Haydar Diljen



SPAS JI BO
ALÎKARÎYA WAN

Beroj Mukrîyanî
Bîlal Guldem
Dûrzan Cîrano
Enwer Ozkahraman
Ferhad Aslan
Jîyan Ozkan
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Orhan Tanhan
Selmet Guler
Tehsîn Baravî
Ugur Sermîyan

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com ✉
folklorame 📷 📸 📺

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsîyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 2

Hejmar: 5

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevînc Adiyaman

Wêneyê bergê pêş: Beroj Mukrîyanî

Wêneyê bergê paş: Orhan Tanhan

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađluk ve Kùltùr Vakfı

İktisadi İřletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. řti.

Orta Mah.Fatın Rùřtù Sk. No: 1-3/A Bayrampařa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919

Naverok

- 5 Ji edîtorî
- 6 Havênê penîrê koçerî û penîrê çalê, **Zeynep Yaş**
- 9 Lorîyên Qelqelîyê-2, **Mehmet Yildirimçakar**
- 13 Werzên salê, **Yûsif Hêşetî**
- 14 Nifirên Devera Meletîyê, **Mahîr Ugur**
- 16 Padîşah û wezîr, **Kurdjan Sorî**
- 28 Nanê binê agir, **Elîf Gunduz**
- 30 Mamikên Qerejdaxê-1, **Mehpûs Serhedî**
- 32 Hesenê Aşewan û riwî, **Hikmet Yıldız**
- 43 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
- 44 Kudirê dagirtî, **Zîya Mukrîyanî**
- 48 Kûskûs Xotûn, **Xidir Mûtlû**
- 50 Meseloka zilamê piştxûz, **Mûsa Tirk**
- 51 Hingyîn, **Sidîq Gorîcan**
- 52 Hevalên Erxenîyê, **Eşref Keydanî**
- 56 Nav û taybetîyên hin cureyên gîyayî li Mêrdînê-3, **Mem Mukrîyanî**
- 60 Biwêjên gundê Çîçikayê-1, **Bêrîvan Matyar**
- 62 Gîtê zimistanî, **Surya Human**
- 66 Motîfên Çîroka Hebhenarkê, **Haşîm Esen**
- 72 Koyê Bîngolî, **Aydin Batur**
- 78 Li Serhedê xwedîkirina gamêşan û şerê gamêşan, **Yaşar Eroglû**
- 82 Mirîşk di zargotinê da, **Bahoz Baran**
- 88 Pêkenokên Helexîyan, **Elîf Gun**
- 92 Sêwaz, di Seyahetnameya Ewlîya Çelebîyî da, **Ozcan Çîçek**
- 100 Hero herrin, **Zerrweş Xodî**
- 108 Danasîn û nirxandina Gulançzêrînê, **Evîndar Şevîn**

Ji edîtorî

Kal û pîrên me dibêjin, “Bihara rengîn, gul û gupikan da bîn.” Hejmara pêncem ya Folklorê Me wekî gul û gupikên biharê vebû û bi bêhna xwe ya xweş li benda we xwînerên ezîz û dilovan e. De kerem bikin, em li ser sifreya me ya biharîn rûnin û folklorê xwe bitehmijînin.

Rojên biharê, mohra xwe li dîrok û çanda me daye. 12ê Adarê û 16ê Adarê. Du birînên ku hîn jî şûna wan baş nebûye. Du birînên ku dikelin. Qamişloka evîne û Helebçeya şehîd, du bajarên birîndar, ji bo kurdan evîndar.

Bihar bereket, hêvî û nûroj e; vîn û evîn, kesk û şîn, dilvîn û xemrevîn e. Bihar geh dilê mirovî dikelîne geh jî mirovî mîna perperîkan li dora kulîlkan digerîne. Bihar her tiştî dihemilîne û hemû tiştan dikemilîne. Bihar di dilê mirovî da dibe a(gi)r. Dil û agir dibin dilagir. Dilagirên dilawer, Agirê Newrozê geş dikin li sikak û kolanan, li çol û çîyayan, li newal û gelîyan, li deşt û zozanan; li Îdîr, Dêrsim, Sêwaz û Wanê, li Akre, Dihok, Şingal û Çomanê, li Îlam, Bane, Bokan û Serdeştê, li Amûd, Raco, Şiyê û Dêrikê. Agir û Newroz du motîfên giring yê folklorê kurdan in. Cejna Newrozê, cejna neteweyî û cejna hebûnê ye. Newroza we pîroz be.

Bihar kewna folklorê ye. Biharê bêrîvan û şivan bi heyranokan birînên dilên xwe dikewînin, pîrejin dewî dikeyînin, keçên xama li pincarê xortan dibînin û ji nava dilan dilekî dihebînin. Zarok li devê çem û kanîyan, li qerac û zevîyan; kereng, tûzik û tolikê berhev dikin û vê gotinê ji devê hev direvînin; “Tûzikê dixwim tol dibim, serxanîyan hol dibim.”

Mirîşka qupketî, motika şikestî, gîyayên biharê, kundirê dagirtî, nanê binê agir, havênê penîrî, zilamê piştixûz, gamêşên Serhedê, Çîyayên Bîngolê, mamikên Qerejdaxê; hin ji wan mijar û motîfên me yê vê hejmarê ne. Xwe biavêjin gundê Çîçîkayê, berê xwe bidin Serhedê, we bivê

biçin aşê Hesenê Aşewanî û bibin mêvanê roviyî, we bivê berê xwe

bidin Midyadê û herin bikevin nava cimeata Helexîyan. Ku

we nevé, herin Sêwazê yan jî mîna keçîka ku li birayên

xwe digere, li kereka xwelîyê siwar bibin û berê xwe

bidin çol û çîyayan. Nebe nebe hûn silavekê bidî-

ne pîrehûtê yan jî amojina Hebhenarkê. Kî hat ber

derîyê we jê bawer nekin û mîna keça zana ya ku

padîşah ji aqilê wê ma heyirî, jêhatî bin; da ku

paşa û wezîr bibin xulam û xizmetkarên we.

Hêvîya me ew e ku nîsan bi baran be, gulan jî bê-

tofan û bi ba be. Ku bû hezîran, em ê bi hejmara

şêşem bîn mala we, rûnin li cem haziran.

Eşref Keydanî



Havênê penîrê

koçerî û penîrê çalê



Zeynep Yaş ▶

Padîşah û Wezîr

Kurdjan Sorî ▶





Nanê binê agir

Elîf Gunduz ▶

Pelên dara gûzê datînin
ser û binê nanî û poşînê jî
bera ser pelan didin;
dibêjin, bi vî hawî jî
tenduristîya mirovan ra
baş e û qewetê dide
mirovan.



Nanê binê agir, xwarineka kurdan e û li Devera Pasûra Dîyarbekirê biharê, havînê û payîzê tê çêkirin. Zivistanê çênabe, ji ber ku bi pelên gûzan û di kuçikê da tê çêkirin. Ev nan piranî jî li çîya û zozanan tê çêkirin. Ji ber ku ev nan qewetê dide mirovî.

Nanê binê agir, li gor daxwazê cur bi cur tê çêkirin. Cureyên wê; yek, rûn lê tê hevîrkirin;¹ du, bi toraqê tê çêkirin; sê, bi kakilan tê çêkirin. Ji bo nanê agir; ar, ava şîrgerm, rûn û li gor cureyên wê tiştên ku dikevin navê, toraq yan jî kakil hewce ne.

Ev nan di kuçikê da tê pehtin. Berîya hevîrkirina wî hewce ye di kuçikê da agir bê dadan, kuçik baş sor bibe û agirê di kuçikê da bibe komir û hinik jî poşîna² agirî çêbibe. Ji ber ku poşînê diavêjin ser nanî. Pelên dara gûzê datînin ser û binê nanî û poşînê jî bera ser pelan didin; dibêjin, bi vî hawî jî tenduristîya mirovan ra baş e û qewetê dide mirovan.

¹ rûn lê tê hevîrkirin: qalibekî gotinê ye wê herêmê ye, bi rûn tê hevîrkirin.

² poşîn: xwelî, arî.

Hesenê Aşewan û riwî


Hikmet Yildiz ▶

“Ezxulam, ew zêr, zêra
Hesen Axa ye. Me pê
seyeda we zêrêr
Hesen Axa dabêtin,
me nezanî ku zêr maye
bee kişteka seyedê da.
Ez bêjim zêr gelek çû
xweşîya we. Heke
Hesen Axa zanîba dê
zêr hinde biçite xweşî-
ya we, dê bo we gelek
zêr rêkiriban.”




Kundirê dagirtî

Zîya Mukrîyanî



Hevalên Erxenîyê

Eşref Keydanî



Gîtê zimistani

Maya mi qal kena vana:

Dewan de zimistan sey şeheran nîbîn, hîna xidar vêreni, la dewijî musîyaye bî loma zaf xem nêkerdêni. Tutitîyê mi de zî wexta bîni zimistan û vore varêni, ma cêke di naylon maylon nêverdêni ma dirnêni û hetanî nîmê şewe serê vore de ma xo tesnêni¹ ma kayî kerdêni û bîni şewê zî ma şîni kîye, şewî derg û dila bî enahew² zî ma hetanî rakotişî goştarîye meselikani zimistanî kerdêni. Zaf-tay babê mi qalê nê meselikan kerdêni. Babê mi nê meselikan ra, wexta zimastan sey xezewatî vêrêni, o çax qal kerdêni. Tera vatêni nê gîtê zimistanî yî. Nê gîtanî ra a yewine meselikê Pis û Qesî yan zî Wisî ya.


1 tesnayîş: şemitiyayîş, herikiyayîş.
2 enahew: na rey.


“Dî ti vaji, to şewa bîne çi dî?”
Cînî ya qije vana:
“Welê şewa bîne yo
tefrûdûmanêke viriştî bi
we ego dar û ber lerzêni. Mi
goştarîyê bine ezmanî kerdi,
hetanî sero sey hot hewî bi şilî
û hot hewî zî bi weşî. Şewêka
xezewê bî, honê mi nêamêni.
Ti heşê mi ra nêvêjîyê, mi xo
rê xo vatêni emşo şewê pis û
qesîya Wis tewer di xeneqêno.”

Surya Human

Motîfên Çîroka Hebhenarkê

Haşîm Esen ▶

 Tehsîn Baravî



Koyê Bîngolî

Koyê Bîngolî de vejîyayîşê tîje hîna zaf mabenê tarîxanê 15ê temmuze û 15ê tebaxe de rind eyseno. Coka ê ke wazenê şêrî uca exlebê xu mabenê nê tarîxan de şînî. Ko de şefeqê serê sibayî de wexto ke hema tîje nêvejîyaya verî asmen sey guînî beno sur. Dima peyê koyan ra tîje sey yew guda adîrî hêdî hêdî vejîyena û bena berz.

Mirîşk di zargotinê da

Bahoz Baran ▶





Sêwaz

di Seyahetnameya Ewliya Çelebîyî da

Derbarê navê Sêwazê da agahîyên cur bi cur hene. Li gor hin agahîyan, li cihê ku navend lê hatîye avakirin sê darên çinarê hebûne, di bin her sê çinaran da sê çavkanî hebûne, her yek ji wan temsîla nirxekî bûye; şikra Xwedayî, rêzgirtina ji dê û bavî ra û hezkirina ji biçûkan. Ji ber ku mirovan di nava jîyanê da ev nirx wenda kirine, ev kanî jî ziwa bûne û navê bajarî jî ji vê peyva “Sîpas”ê tê, ku tê wateya her sê çavên kanîyan.

Ozcan Çîçek

Destpêk

Ewliya Çelebî gerokekî tirk e. Di sedsala XVIIan da li parzemîna Asya, Afrîka û Ewropayê gerîyaye. Seyahetnameya Ewliya Çelebîyî, di nava berhemên rêzgirtî da cihê xwe digire. Berhema wî li gelek zimanan hatîye wergerandin. Ewliya Çelebî, cara ewil li Sêwazê leqayî kurdan dibe (Aktaş, 2011). Ewliya Çelebî, li erdnîgarîya kurdan seranser gerîyaye û wî bi zimanekî herikbar çî dîtibe, çavnêriya çî kiribe nivîsiye. Ewliya Çelebî jî wekî gerokên din, ji bo erdnîgarîya kurdan, navê Kurdistanê bi kar anîye. Em dikarin bibêjin ku Ewliya Çelebî, di serî da li Dîyarbekir, Erzirom, Bedlîs, Wan, Meletî, Elezîz (Xarpêt), Riha, Mêrdîn, Erbil, Sîncar, Îmadîye û Sêwazê gerîyaye. Di gotineka xwe da heft, di gotineka xwe ya din da jî dibêje yazdeh salan li Kurdistanê gerîyaye” (Akbaş, 2015:47). Ewliya Çelebîyî ji bo erdnîgarîya kurdan carna “Kurdistan” carna jî “Diyarê Kurdistan” bi kar anîye.




Hero herrin

Zerrweş Xodî



Danasîn û nirxandina pirtûka “Gulançkzêrîn”ê



Binbeşên zargotinê cur bi cur in; çîrok jî yek ji wan e, lê ew bi xwe jî û navên wê jî cur bi cur in. Çîrokên li ser heywanan, meselok, çîvanok, çîrçîrok, çîrok, xebroşk û hwd. Berhevên vê pirtûkê di bin navê du beşên sereke da hatine rêzkirin. Beşa destanê dîyar e, li hêlekê ye. Beşa din, ya dirêj “Çîrok, Çîvanok” ji pêncî û pênc berhevan pêk tê. Weşanên Wardozê di nivîsa xwe ya serê pirtûkê da dibêje, “Peyva çîvanokê, di vê pirtûkê da ji bo meselokên kurt hatîye bikaranîn.” Meselok, jixwe kurt in, ji çîrokên din cuda ne û ji wan xweş dîyar dibin. Sî û yek berhevên pêşî ji vî cureyî ne

Evîndar Şevîn